

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

*Xebat ji bo* :
*** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.**



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 120 )* *Sal 21 Avrêl û Gulan* *2016 z - 2628 k* *Buha (50)L.S*


# Di cejna rojnamevaniya Kurdî de ... Derdên giran û hêviyên mezin


**Desteya sernivîser**


Roja 22ê Nîsana sala 1898an, li paytexta Misrê, Mîr **Miqdad Midhet Bedirxan** rojnameyeke du heftane bi zimanê Kurdî û tîpên Erebî li çapxana El Hîlal çap kiriye û weşandiye. Armanca xwe ji deranîna vê rojnameyê di pêşgotina hejmara pêşîn de bi vî awayî diyar kiriye:

*".. Vê cerîdeyê de, ez ê behsa qenciya 'ilm û me'rifeta bikim, li kû derê mirov di'elime, li kû derê medrese û mektebên qenc hene, ez ê nîşa Kurda bikim, li kû derê çi şer dibe, dewletên mezin çi dikin, çawe şer dikin, ticaret çawe dibe, ezê hemiya hikat bikim. Heta niho, kesî cerîdekî holê ne nivîsîye. Ev cerîdeya min a ha, ya 'ewilî ye. Lewma, wê gelik kêmayî hebitin. Ez hêvî dikim kêmaya cerîdeyê ji min re*



كردستان
١٣١٥

*binivîsin. Hemî tişt wekî nû çê dibin kêm in, paşê hingî diçe, dikewe(dikeve) rê de. Eve êdî ez ê dest meqsedê bikim…"*

Ji bo pêkanîna guhertineke kûr di hiş û jiyana gelê xwe yê bindest de, Mîrê gewre, ……

2

## Li Bajarê Qamişlo Xêzên Sor Bi Xwînê Têne Danîn





**Hekîm Ehmed**


Bêhtir mehekê derbas bû, ku xelkên Qamişlo li bombebarana Nisêbînê temaşe û guhdar dikirin, dilên wan jî bi xaniyên wan re dihejiyan, Nisêbîn bajarê bi Qamişlo ve ye, û ji bilî têlên sînor di navbera taxên wan de tunene, wilo jî wêneyên ku ji Şêx Meqsûdê dihatin, dîmena bobelatê xembar û tarîtir dikir, gelo mirov ta çi astê dikare êşan bibîne, bibhîze û bi wan re bijî? ……..

3

## Çalakiyên Saziyê (SFPZK)

***Qamîşlo***- Bi helkefta cejna zimanê kurdî, îro 15ê Gulana 2016an, li bajarê Qamişlo komîta Nefel a Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî şahiyek li dar xist. Şahî li hola pakrewan Silêman Adê hate lidarxistin. Mamoste Ehmed Erefat gotina Saziyê xwend, û gotina komîta Nefel jî hate xwendin, di nav re 3 ciwanan(Cano û Ahîn û Canê) awaz û stranên xwe pêşkêş kirin, herwiha her du helbestevan Dilbirîn û Dilêrê Kurd bi helbestên xwe .....

7

**Di cejna ... Dûmahîk**

xewa şevan li xwe biriye, zor û cefa kişandiye, pere xerc kirine, bi zanistî û dilsozî pênûsa xwe xebitandiye. Û da ku zana û xweşmêrên Kurdan karibin vê belavoka nûhatî bixwînin û bidin xwendin, her du heftan wî 2000 rojname bê pere şandiye Kurdistanê. Dilê gel bi derçûna wê şa bûye, bi dilgermî ew hembêz kiriye û bi giranî xebata mîrê xwe nirxandiye.

Çendî mîr hewil daye ku rêdana çapkirin û belavkirina vê rojnameyê bi şêweyekî fermî ji dewleta Osmanî wergire, lê mixabin ku her ev xwesteka wî ya rewa ji bal Xinkar û rawêjkarên wê ve hatiye redkirin.

Piştî belavkirina 5 hejmaran ji rojnameyê, mîr Miqdad ji Qahîreyê vedigere li Istanbolê rûdine. Lê birayê wî, mîr Ebdurehman Bedirxan ustubariyeke giran li xwe digre, ji xaka dewleta Osmanî derdikeve, li biyaniyê, ji welatên dûr, weşandina rojnameyê didomîne. Roja 10ê Çiriya Pêşîn a sala 1898an, ji Cinêva paytexta Swîsrayê, hejmara 6an diweşîne.

Di sergotara vê hejmarê de, mîr Ebdurehman weha dibêje:

*"...Ev cerîdeya ha, 'eta(heta) niho, birayê min Miqdad Begê derdanî, lakin, çiku Xinkar nehişt ew li Misrê rûnit, vegera Istanbolê. Cerîdeya xwe nikarî Istambolê derînit, seba wê jî çiku mirovê mezin yê dor xinkar hemî xayin, bê esil neseb in, neyarê ciwanmerda ne, çi xesma ku yek ji wan heye navê wî Ebu El Huda ye. Ew temamî esil û neseb mitirb e. Çiku ew ji hemiya bê esiltir e, ji hemiya zêdetir neyarê mala Bedirxan Begê ye. Ew neyarê hemî Kurda ye, navê (naxwaze) qencî li Kurdan bibe. Ew Xinkar dixapîne. Be rastî, ew ne Ebu El Huda ye, ew Ebu El Delal e, fusq û hesedê de bê heval e. Ew nahêle lawên Bedirxan Begê cerîdeyek holê derêxin da qencî ji Kurda re bibit. Lewma ez ku lawê Bedixan Begê me, ji te'esub û himyeta xwe, ji milkê Xinkar derketim hatim diyarên xerîb da ez vê xidmetê ji weten û ji miletê xwe re bikim. Ji kerema Xwedê hêvî dikim ku Kurd jî pê vê cerîdeyê ji xewa giran a kevnesala şiyar bibin..."*

Xinkarê Osmanî Ebdulhemîd ê serxweş û şêwirmendên wî yên bê ol û zikreş, bi tundî şerê derçûna vê rojnameyê li derveyî welêt jî berdewam kirine, bi her hawî givaş û fişar dijî wê bikar anîne û astengiyên mezin ji mîr Ebdurehman re çê kirine. Lê, xwediyê rojnameyê, kurê mîrê Botan pêdariyeke bê mînak nîşan daye, û her ew ji welatekî çûye yekî dîtir û bê westan rojnameya xwe parastiye, ji gelê xwe re weşandiye. Roja Duşembê, 6ê meha Muherem a sala 1320an Koçî, beramberî 15ê Nîsana 1902an hejmara dawî, ya(31)ê ji vê rojnameya pîroz hatiye weşandin. Gelê Kurd roja derçûna vê rojnameyê weke cejna rojnamevaniya Kurdî bi nav kiriye û sal bi sal bi coş û şahî wê rojê pîroz dike.

Di vê cejn û boneyê de, piştî derbasbûna 118 salan di ser weşana yekemîn rojnameya Kurdî de, bi kurtî be jî, pêwist e em rewş û pergala rojnamegerî û tevaya ragihandina Kurdî di ber çavan re derbas bikin.

Di roja me ya îro de, rojnamevanî digel hemû beş û alavên ragihandinê li ser asta



cîhanê bi firehî pêş ketine, ew dikarin bi awayekî zindî wêne û hûrdengan ji binê deryan, ji asîmanên dûr… û hwd yekser ji guhdar û temaşevanan re veguhêzin. Ango mirov dikare bibêje ku şoreşeke ragihandinê li cîhanê rû daye û ademîzad ber û meyweyên vê şoreşê dixwe.

Bê goman e ku ragihandina me Kurdan jî di hemû waran de gavine berçav avêtine. Dema îro bi dehan kenalên televizyonê, bi sedan îzgeh, pirtûk û rojname bi zimanê Kurdî li welêt û derve têne weşandin ku ew cihê şanazî û serbilindiya me ye. Lê, em dikarin têbîneke giring bînin zimên ew jî ew e, ku eger pêwistiya gelên cîhanê carekê bi belavkirina çanda nûjen a mirovhezî, hezkirin û gotara hevgirtinê hebe, ya me Kurdan deh caran pê heye, ji ber ku ta roja îro, li cîhanê gelê Kurd bi hejmara xwe ya dor 45 milyonan, li cîhanê, gelê bi tenê ye ku hê ew di bin destlatdariya gelên cîran de bê azadî, di mercên kirêt û dijwar de dijî..!

Îro, çirûskên azadiya gelê me di bin ewrên reş û tarî de ronî didin, lê xêrnexwaz û neyarên azadiya gelê me dixwazin û hewl didin ku dîsa weke her car Kurdan bi kurdan bidin şikandin, da her û her ew di bin nîrên bindestî û sitemê de bê vîn û kole bijîn. Di vî warî de, tê zanîn ku hin dewletên heremê bi milyonan peran xerc dikin, agirê zikreşî û berberiya Kurdan tevdidin, geş dikin û şûrê birakujiya wan disûn û tûj dikin. Pêwist e keç û lawên gelê me yên di ragihandinê de dixebitin, zîrek û şiyar bin, ... 11

**Li Bajarê Qamiş... Dûmahîk**

Dorpêçkirina jiyanê û bi-habûna pêdiviyên rojane, nex-asim yên xwarinê, dihêle mirov mijûl bibin û biwestin, lê hestên wan şiyar dimînin, biryarên rijîmê ku divê karmendên dewletê tevlî hêzeke wê ya leşkerî bibin, rewşa gelek mal-batan dijwartir dikir, çimkî mûçeyên wan bi mehaneyên netevlîbûna vê hêzê hatin rawestandin, lê tevî ewqas nexweşî, jiyan berdewam e, bîranîn û helkeftên meha Avdarê jî ev ji xelkê re digotin, belê ji-yan berdewam dibe, cejnên Kurd, Siryan û Êzdiyan li dûv hev rêz dibin, tevde bê şahî, lê bi aramî derbas dibin.

Li derveyî bajêr, li hinek gundên alîgirên rêjîmê û Mîlîşi-ya (Berevaniya Niştimanî) durişmên li dijî Kurdan û pro-jeya fidralîzmê hatin hildan, lê kesekî nizanîbû ku pilanek ji bo vî bajarî tê amadekirin.

Roja Çarşemê 20 Avrêlê, hêzên ewlekariya rêjîmê bi destê hêza ku nav lê dibe (Berevaniya Niştimanî) hin welatiyên sivîl û endamên Asayîşê revandin û li kolanên nava bajêr gule berdan, di encamê de, ji welatiyan û Asayîşê şehîd bûn, ji ber çar-goşeya ewlekariya rêjîmê di nava bajar de ye, wan bi vî karî çûn û hatin rawestand, bazar hate girtin û xelk tevde kete tirsê, rewşa birîndaran jî ne xweş bû, ji ber ku nexweşxane, yan li nava bajêr in, û yan jî riyên wan di wir re derbas dibin, ev jî bû kelemek li pêşiya dermankirina ku gerek e bi lez bûba.

Bersiva Asayîşê dereng nema, çargoşeya ewlekariyê hate dorpêçkirin, riya navbera wê û firokxaneyê hate girtin, lê rêjîmê dest bi mûşekan kir û kolan û tax topbaran kirin, herwiha li (Haret Tey) taxa başûrî bajêr ku nişteciyên wê ji pêkhateya Ereb in, kon hatin vegirtin ji bo biçe-kirina pêxwasên xwe, li wir jî asayîşê ew dorpêç kirin, kombûna wan belawela kir, êlên Ereban jî nas kirin, ku ewên ji wan re dibêjin em berevaniya we dikin, bazarekê ji bo berjewend-iyên xwe dikin, ji bo aramî vege-re daxuyan derketin û civat li dar ketin, mixabin hêzên siyasî yên Kurdî nikarîbûn vê carê bi ci-vateke giştî dilên xelkê xweş bi-kin.

Barandina mûşek û guleyan, bi dehan birîndar û şehîd kirin qurban, lê hêzên Asayîşê û YPG zindana navendî ya li taxa Elayê rizgar kirin, û hêzên ewlekariyê di nava dorpêçê de hiştin, me-tirsiyên çûnûhatinê pirtir dibûn, derketina sivîlekî ji hundirê malê dibû, ku bibe sedema rastî guleyên wan hovan bibe, mûşek li taxan dikevin, tenê tevgereke biçûk hebû, ku hinek malbatan zarokên xwe ji taxên navenda bajêr û nêzîkî pevçûnan bo taxên din dûr dixistin, herwiha li her taxekê xalên asayîşê û hêzên wê yên bi Hêzên Cewherî bi nav dibin, hatin danîn.

Piştî çend rojan, rêkeftinek di navbera Asayîşa Rojava û hêzên rêjîmê de li firokxaneya Qamişlo çêbû, di wê rêkeftinê de, Asayîşê gelek xêzên sor li pêşiya hêzên rêjîmê danîn, da ku nema destwerdanê di jiyana xelkên Qamişlo û Asayîşê de bikin, divê



rêjîm mîlîşya xwe ya bi navê Berevaniya Niştimanî nehêlê û nema mûçeyên karmendan rawestîne, ji ber ew tevlî hêzên wê yên leşkerî nabin, herwiha wan neçar neke, ku tevlî hêzên wê yên leşkerî bibin, xaleke din ji bo lihevhatinê: Divê her du alî girtiyên li ba xwe serbest berdin, divê rêjîm ji aliyê aborî ve rahêje stûbariya xirabûn û ziyanên ku di encama topbarandina taxan de li sivîlan bûne, herwiha li ber malbatên şehîdên sivîl jî, ya din rakirina rewşa awarte ji ser ba-jêr, da ku aramî vegere jiyana xelkê û her aliyekî vê rêkeftinê li cihên kontrolkirina xwe bimîne.

Roja Çarşemê 29 Nîsanê, xelkên bajarê Qamişlo derketin pêşwaziya pakrewnên xwe, le-hengên Asayîş û YPG û sivîlên bêguneh, ku di van bûyeran de derbasî nava dîroka qurbaniyên vî welatî bûn, û li goristana şehîd Delîl Sarûxan bo axa pak hatin spartin.

Hêjayî gotinê ye, ku di vê kar-wanê de jî, jin, mêr û zarok, sivîl û şervan, Kurd û Ereb tevlî hev bûn, tevî ku nakokiyên siyasî li navçeyê dîsa gur bûbûn, û hin diyardeyên neyînî di çalakî û daxuyanan de derketibûn, lê we-latiyên Qamişlo bi hev re, bi rêz-girtin û dilsozî li dûv pakrewanên xwe meşiyan.

# Gelê Kurd Di Şer û Siyasetê de

Nûşîn Bêcirmanî

Kurd, weke miletekî ku di welatê xwe Kurdistan a parçekirî de dijî, li seranserî dîrokê de, stembarî û çewsandin bi hemî rengan borandiye û di pêvejoya xebata xwe ya rizgarîxwaz de ranewestaye. Bi dehan şoreş li dijî dagîrkeran vêxistine, û bi hezaran qurbanî jî dane.... Eger mirov li dîroka kurd vegere, dê ji her çiyayekî, deştekê, zinarekî û kevirekî bi sedan çêrok û efsanên lehengî û qehremaniya gelê kurd bibihîzê... Ji şêx Mehmûdê Hefîd, Simko Axa, Se`îdê pîran, Qazî Mihemed û ta bigihê Mela Mistefayê Berzanî û herweha jî şoreşên kurd yên ku di serdema nûjen de vêketine, û ta roja îro.

Ji Şêx Ubeydulah Nahrî , yekemîn kesê ku di sedsala Nozdehemîn de doza yekîtiya Kurdan û damezirandina Kurdistaneke serbixwe kiriye, û di sala 1877an de karê aşkere li dijî Osmanî û Îraniyan kiriye, ta Şêx Mehmûd Hefîd ê ku di sala 1919an de serweriya tevgerên leşkerî li dijî Îngilîzan kiriye.. Û Simkoyê Şikakî yê tevgereke çekdarî di salên 1920 – 1925an de li herema Ormiya li dijî Hikûmeta Îranê, bo damezrandina dewleteke Kurdî saz kiriye .... Her wisa jî serhildana Şêx Se'îdê Pîran, ya ku di 14 wilayetan de pêket, û 600 hezar şervanên kurd tê de beşdar bûn , û şoreşên Barzanî li dijî rijîmên ku desthilatdariya Iraqê wergirtibûn, herweha jî hemî şoreş û serhildanên kurd seranserî xaka Kurdistanê serê xwe hildane ta roja îro....

Xebata her miletekî mafwinda, ku welatê wî dagîrkirî be, bi gelek şêweyan tête kirin, çi leşkerî, çi rêzanî, civakî û çandî be..

Seranserî dîroka miletê Kurd û hemî şoreşên ku vêxistine, kêm caran di şer û cengan de ji aliyê leşkerî û çekdarî ve şikestiye; lê mixabin hemî şoreş û serhildanên gelê kurd, ji aliyê siyasî ve têkçûne, û nimûne jî gelek in, mîna şoreş û serhildanên Şêx M. Hefîd, Simko Axayê Şikakî, Şêx Se'îdê Pîran, Qadî Mihemed, Mele Mistefa Barzanî... Her û her di Siyasetê de bi ser nediketin û gel baca mezin dida.

Di baweriya her yekî kurd de, çi biçûk, çi mezin, siyasetmedar an jî rewşenbîr, nivîskar û çi kesê ku bi siyaset û pirsgirêka miletê kurd mijûl dibe, vê rewşê baş dizane. Ev pirs jî ji hêla her kesî ve tê kirin ......Gelo çima Kurd di siyasetê de bi ser nakevin?!!

Ev diyarde jî baş diyar e..... Ji kevin de û ta îro roj, em weke Kurd di hevbendiyên navxweyî de, rastî gelek asteng û keleman di pêşiya nêzîkbûn û yekîtiyan de dihatin. Gelek ji van sedem û aloziyan jî – weke diyar e - ne ji bo berjewendiyên gel û pirsgirêka wî ne. Di destpêka van nêzîkbûnan de, guftûgoyên ku dibin, mijarên kesayetî, êlî


“ Simkoyê Şikakî “

yan jî partiya ne, bihtir bal tê kişandin bi ser de, yan jî ew kul û armancên sereke ne ; ne berjewendiyên milet û welat in. Ev ji hêlekê ve. Ji hêla dî ve, eger tiştin ji van lihevkirinan jî bêne damezrandin û kar jî bi wan bibe , mixabin , ew şêwe berdewam nake, parçebûn û dûrketina ji hev , zû kon û siya xwe bi ser wan de belav dike, di encamê de hêza wan ji hev parçe dibe... Ya xerabtir ji van û wan, ew bi xwe jî, da ku berjewendiyên xwe biparêzin û bidine pêş, dibine destik di destê dijmin de, ew jî – ango dijiminê wan – bi wan dilîzin, ew di bin de yek in û tim û tim pilan û lîstokan bi hev re li dijî .... ...5

**Gelê Kurd ... Dûmahîk**

wan dirêsin ....


Hêjayî gotinê ye ku divê têkiliyên navxweyî di navbera hêzên kurdî û kurdistanî de erênî bin. Pêdivî ye ku ev rastî ji bîr nebe, çunkî ji bo çareserkirina doza miletê Kurd a netewî ew bingeheke pir giring e. Herwiha, girîng e ku ev xaçerê li ber çavan bête danîn, û sûde jê bête wergirtin:

1 – Têkilî û yekîtiyên di navbera partî, çarçew, komele, sazî û tevaya hêzên her parçekî ji kurdistanê, gerek baş werin hûnandin, li ser roniya berjewendiyên gelê Kurd di her parçekî ji kurdistanê de, bêne avakirin......Ev yekbûn û têkilî gerek dûrî berjewendiyên kesane û partiyane bin, çikû çendî têkilheviyên navxweyî xurt, asê û tekûz bin, wilo jî wê rê li ber destêwerdanên dijmin û xêrnexwazên miletê kurd were girtin. Nimûne Hevbendiya Kurdî ya ku di sala1986an de di navbera 3ê partiyên kurdî û Encumena siyasî de hate damezrandin, ya ku hate avakirin piştî ku hin ji partiyên hevbendiyê xwe jê vekişandin.... Herweha li parçên Kurdistanê yên dîtir jî nimûnene wisa hene, weke CÛD û COQED .....Di heman demê de, gerek têkilî û peywendî di asta niştimanî de, di navbera hêzên kurdî û yên niştimanî de, bêne ristin, da ku li hember kiryarên rijîmên zordar xebateke hevbeş bikin bo çareserkirina pirsgirêka kurdî di wî parçî de, weke yek ji pirsgirêkên niştimanî yên wî welatî. Ne tenê wilo, gerek partiyên tevgera kurdî mil li mil, li hember zordariya wan rijîman rawestin , lê li gor peymanine nivîskî, ku mafê miletê Kurd di wan de nîşankirirî be, ne li hêviya demê û rûxandina wan rijîman bimîne; ji ber di gelek ezmûnan de hatiye xuyakirin ku rikberiya welatên ku parçên kurdistanê bi wan ve hatine girêdan, sebaretî mafê miletê Kurd, ji rijêmên xwe zordartir û xirabtir in. Gelo tevgera kurdî di vî alî de pispor e ? ma van têkiliyan li gor berjewenda gelê kurd dihûnê?

2- Di asteya Kurdistanê de jî, pêwîst e ku têkilî û hevrêziya siyasî di navbera hêzên kurdistanî de li her parçeyekî ji Kurdistanê, hebin. Ji erkê tevgera siyasî li her parçeyekî, ji parçeyên din re piştgir û kûrbûnên istiracî be, ne tenê wilo , gerek tevgera kurdî li her parçeyekî, ya parçeyên dî ne êxe bin bandora xwe de û wilo jî destêwerdanan bike ....Pirsek giring xwe davêjê holê; gelo ev pêwendiyên kurdistanî, di wê radeyê de ye ku berjewendiyên netewî yên bilind ji miletê Kurd re, diparêzê û dide pêş?!..... Di baweriya min de, na !.... Belkî di vê mijarê de gelek kul, derd û pirsgirêkine mezin jî hene, hewcedarî gotar û lêkolînin taybet bin, ta ku bi rengekî zanistî zelal bibin.







3- Di asteya nevnetewî û cihanî de, gelo diblomasiyeta kurdî di demên berê de û ta niha, lîstok û pîlanên derbarê miletê kurd û welatê wî dihatin hûnandin, gelo miletê Kurd û bi taybetî tevgera wî ya siyasî , bi rengekî zanistî ev kar bi rêve dibir??

Di baweriya min de ew jî, na ye!.......Ji ber, hema li Kurdistana rojhilat gelek caran rêvebirên kurd bi destê rijîma Tehranê û di heman rewşê de hatine kuştin, ji E.Rehman Qasimlo, Sadiq Şeref kendî, ku di guftogoyên bi rijîma Îranî re dihatin kuştin, em ji bîr nekin ku xebatkarê kurd Mele Mistefa Berzanî jî gelek caran rijîma diktator ya Îraqê hewl daye ku wî bikujê, lê nediçû serî... Ji bilî wê, tevgera kurdî peywendiyên bi rêkûpêk ava nekiriye, û berjewendiya gelê xwe nedaye pêş; ji demek nêzîk ve diyardene baş di vê rewşê de hatine xuyakirin; ew jî hîn destpêk in.

Li gor van xalên derbas bûyî, hate xuya kirin, em Kurd û tevgera me ya siyasî bi ser neketine di aliyê siyasî û diblomasî de, gelek caran jî bûne qurbana pîlanên navdewletî jî. Nimûneyên balkêş jî hene di vê derbarê de, hîn li bîra me ne. Komara Mehabadê ya ku di (22ê Çileyê 1946ê) hatibû ............⓫

# Roja Rojnamegeriya Kurdî



Bi boneya cejna roja rojnamegeriya Kurdî, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê bi gelek çalakiyan rabû. Rêxistina partiyê li herêma Cezîrê, herêma kurdistana Îraqê, li Kobanê û li Efrînê aheng li dar xistin. Di ahengan de, çalakiyên hunerî, stran û govend hatin girêdan, û gotinên çapemeniya partiyê bi her du beşên xwe, Kurdî (Kovara Pirs û Rojnmama Newroz), û beşê bi zimanê Erebî (kovara Al Hîwar û Rojnana Yekîtî) hatin xwendin, û hemiyan bûyera derxistin Rojnama Kurdistan li 1898an ji hêla Mîr Miqdad Midhet Bedirxan de pir buha û nirxdar dîtin, û giringiyeke mezin dane rola ragihandin û çapemeniya Kurdî ya nûjen, nemaze jî di van demên pir taybet de ji dîroka gelê Kurd.

Di peyva Kurdî ya partiyê de, li ser vê boneya dîrokî û giranbuha wiha hate gotin: ((Di rojimêra Kurdî de, roja bîst û diduyê Avrêlê, rojeke watedar e. Ew roja jidayîkbûna rojnamegeriya Kurdî ye. Di vê rojê de, li sala 1898an, li bajarê Qahîrayê paytexta Misrê rojnama KURDISTAN ronahî dît, û firkeke zor hêja û girîng xiste jiyana rewşebîriya gelê Kurd… Lê piştî rawestandina rojnama Kurdistan li sala 1902an, ronakbîr û rewşenbîrên Kurd li tevgera rojnamegeriya kurdî xwedî derketin, li hundir û derveyî Kurdistanê bi dehan rojname û kovarên bi zimanê Kurdî hatin weşandin, û rola xwe ya ronakbîriyê di jiyana gelê Kurd de birin, û ew ji xwendevan, nivîskar, rewşenbîr û ta siyasetmedarên Kurd re jî, bûn meydana helwestdayîn û ronakbîriyê. Ne tenê weha, lêbelê rola wan rojname û kovaran di parastin, pêşxistin û nûjenkirina zimanê kurdî de jî, baş hebû… Û piştî damezirandina yekem partiya siyasî li Sûryê di sala 1957an, rewşenbîr û nivskarên Kurd, nemaze yên ku bi zimanê kurdî mijûl dibûn, cihê xwe di nav refê partiyê de girtin, û guhdaneke balkêş dane rojnamegeriya Kurdî. Yekem rojname- bi zimanê dê (Dengê kurd) a Partiya Demokrat a Kurd bû, piştre gelek kovar û rojname jî derketin… Hêvî ew e, rewşa rojnamegerî û ragihandina Kurdî baştir bibin, û bigînin asta çapemeniya nûjen…)).

Li herêma Efrînê du aheng li dar ketin, yek Meydankê û ya din jî li devera Cindirêsê bû. li ahenga Meydankê rojnamevan Ehemd Mihemed (Ehmedê Qitmê), ji ber çalakiyên xwe di warê ragihandinê de, ji hêla Komîta amadekirina ahengê de hate xelatkirin. Û li ahenga Cindirêsê, rojnamevana zîrek Emîne Misto jî, ji ber çalkvaniya wê ve hate xelatkirin. Û Xelata Kemal Henan ya Pesendkirina nivîsandina bi zimanê Kurdî jî, komîta xelatê nivîskar û helbestvana hêja Merwa Brîm xelat kir.

# Seredana gora hevalê pakrewan Îsam Elo



Bi boneya salvegera duyem ya şahîdketina hwvalê me yê hêja Îsam Elo, şandeyek ji rêxistina Şikaka ya Partiya me PYDKs li gel mal û bira û mervên wî, çû seredana goristana gundê Qitmê, û gurzek gul li ser gora wî danî. Li ber gorê, heval Mihemed Îbiş kurtegotinek bi navê rêxistina partiyê ya devera Şikaka kir, tê de sincî, dilsozî û xebata hevalê nemîr Îsam bi bîr anî. Piştre, birayê pakrewên, rêzdar Husên Elo jî gotinek bi navê malbatê kir, bixêrhatina hevalên birayê xwe kir û berdewamî ji xebata wan û partiya birayê xwe re xwast. Rêz û rûmet ji giyanê pak yê hevalê me yê nemir Îsam Elo re.

**Çalakiyên Saziyê ..Dûmahîk** şahiya me xweştir kirin. Mamoste Ehmed jî gotineke bi navê rojnameya Bûyer got. Di vê şahiyê de, xwendekarên sê korsên Asta yekê û yeke ya duyam, fêrnameyên xwe wergirtin..

Li roja 9- 5- 2016 an, bajarê Qamişlo, li goristana Mehmeqeya, şandeke SFPZK, çû serdana gora nemir Mele Ehmedê Palo, ku di vê rojê de 25 sal di ser koçkirina wî re derbas dibin.

SFPZK, li ahenga derçûna kovara Nivîskar li Qamişlo, Xelata Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriya wergirt.

***Dirbêsiyê***- Ahengeke navendî



li Dirbêsiyê di roja zimanê Kurdî de 15/5/ 2728 K / 2016Z bi amadebûna nûnerên partiyên tevgera kurdî li sûriyê û cemawerekî gewre û ji serkirdayetiya Saziyê û şande ji rêxistinên Hesekê û Serêkaniyê jî hate lidarxistin. Gotina Saziyê mamoste Nûşîn Bêcirmanî xwend. Heval Hisên Bedir gotina Partiya Yekîtî ya Demkrat a Kurd da, Hêjayî gotinê ye, SFPZK ji hêla serkirdayetiya Partiyê ve hate xelatkirin Li dawiyê fêrnameyên Asta yekem û asta duyem li 127 şagirtan hatin belavkirin.

***Efrîn***- Li roja 15/5/2016an, bi boneya Cejna Zimanê Kurdî, şaxa Efrînê ya SFPZKs, li hola Dîlan li bajarokê Cindirêsê, ahenga şahiya xwe li dar xist. Di ahengê de, gotina SFPZK û Gotina Partiya Yekîtî (PYDKs) hatin xwendin, piştre helbestvan Merwan Berkat û Gulistan awaz çend helbestên xwe xwendin. Zarokên amojgeha Ariya ya mûzîkê, li gel hunermend Cîhad stranên xweşk stran. Li dawiyê çar şagirt û mamosteyên ku di ber zimaê kurdî de westiya bûn ji hêla Saziyê ve hatin xelatkirin û rêzname wergirtin.

Ev in kîtin ji gotina PYDKs di roja cejna zimanê kurdî de li ahenga navça Efrînê:

**((Xûşk û birayên rêzdar** … Bi vê boneya pîroz, boneya derçûna hejmara yekemîn ji kovara Hawarê bi tîpên latînî li 15/5/1932an, ew roja ku ji aliyê navenda Mezopotamiya, li Amedê , li sala 2006 an bi ((Cejna Zimanê Kurdî)) hatiye navandin, em hemî beşdaran silav dikin, Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî sipas dikin, piştgiriya xwe jê re nîşan didin û serkefitinê ji xebata wê re dixwazin.

…Gelê me yê Kurd jî weke hemî gelên cîhanê xwedî kesayetên rewşenbîrî û ronakbîrî ye, ew xebatkarên ku xwe ji bo serkeftina gelê xwe kirine qurban, çi di warê siyasî û şoreşgerî de, û çi di warê çand û zimên de. Ji nav wan nemir û gorbuhiştên Kurd, ku şoreşk çand û zimanzanînê ji bo miletê xwe çêkirine Mîr Celadet Emîn Alî Bedirxan e, neviyê Mîr Bedirxan mîrê cezîra Botan e.

…Partiya kurdî ya pêşî û partiyên Tevgera Kurdî yên ku ji partiya dê çêbûne, barê fêrkirin û parastina zimanê kurdî kirine erkek û dane ser milên xwe, çi di civatên xwe de, çi di riya korsên taybet re û çi jî di riya belavkirina pîrtûkên zimanê kurdî û alfebeyan re. Yanê rola tevgera kurdî di hînkirin û parastina zimanê kurdî de berz bû, û gelek xebatên cûrbecur ku niha di ber zimanê kurdî de têne kirin, encam û berhemên ew xebata pêşîn in.

… Lê em ji bîr nekin, ku di pêvajoya borî de, ji bo hînkirin, parastin û belavkirina zimanê kurdî, rola hin kesayetî û partiyên Tevgera Kurdî pir berztir û xuya bû, jê rola partiya me Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûryê berz û berçav bû.

Di vî warî de, em xebata Saziya Zimanê Kurdî û desteya hînkirinê ya rêvebiriya xweser – çiqas têbîn li ser rêbaz û şêweya fêrkirinê hebin jî – û fermîkirina zimanê kurdî di dibistanan de, buha dinirxînin û biryareke wêrek dibînin))…



# Girîngiya Zimên

Nazdar Hesen

Ji ber ku ziman bingeha mirov û nasnama her neteweke ye, rewşenbîrê gewre Nûreddîn Zaza dibêje : "Eger hûn dixwazin xwe nas bikin, û bidin nasîn , divê berî her tiştekî zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin ". Ev tê wateya girîngiya bikaranîn, fêrkirin û parastina zimên e. Ji ber ku di dîrokê de, gelên zimanên wan winda bûne, ew bi xwe winda bûne, ango, em dikarin bi riya zimên dîrok, netewe, çand, wêje, kultûr û ramanên xwe biparêzin û binasînin, lewra, tucarî gelê me yê Kurd ji bo parastin, nûjenkirin û pêşxistina zimanê xwe




ranewestiya, tevî derbasbûna wan di pir rewşên kambax û dijwar re, û bindestiyên wan û qedexekirina zimanê kurdî ji sedsalan de, ji ber vê jî zimanê xwe kiribû erkeke netewî, her dem li ser dixebitî. Pir zimanzan û rewşenbîrên Kurd hewl didan, ku zimanê xwe di her warekî de zengîn û dewlemend bikin, bi riya weşanan, wek: Pirtûk, belavok, kovar, rojname û……. H.W.D, tucarî ne diwestiyan û neditirsiyan, li her dem kar û xebatên wan berdewam bûn. Yek ji zimanzanên herî gewre Mîr Celadet Bedirxan e, wî bingeha rêzimanê Kurdî ya nûjen û yekemîn alfabeya Kurdî bi tîpên latînî danî, û Kovara (Hewarê) weşand. Ji ber ku ew gaveke dîrokî bû, û di sala 2006 an de weke Cejna Zimanê Kurdî hat ragihandin, û her sal di 15 Gulanê de bi boneya vê rojê, aheng, şahî û semînar tên li darxistin. Birastî berhemên têkûşînên van zimanzanan ta roja îro di fêrkirin û parastina zimanê kurdî de roleke pir mezin lîstine, vêca ustûbariya me hemiya ne, ku di riya têkoşînên ewan pêşengên zimanzanan de rêwijin, û hêviya ku zimanê me bibe zimanekî ku bi şaristaniyê re bimeşe.

---

# vejîna Zimanê kurdî

Zozan Ebdo

Bi Erebî, Îngilîzî, Tirkî û zimanên din daxêvin, û hinek din jî fêrbûna xwe ji zimanên din re mîna zimanê Elmanî pîroziyeke mezin ji bo xwe dibînin, lê hema di rastiyê de ew tenê ji ber koçberiya wan e. Mixabin! zimanê kurdî jî li paş perdeya dîrokê maye.

Ma gelo win dizanin ku yekem peyv ku di dîrokê de ji zengilora mirov derket peyveke kurdî bû, û yekem gotin hat nivîsîn bi kurdî bû? Ma win dizanin bi qasî kulîlkên ku niha di van rojan de li pişta darên zeytûnên Efrînê hatine barkirin, ewqas jî hewildan ji bo tunekirina vî zimanî hatine kirin, û hîna jî bi dawî nebûne. Tu rojê ev ziman bi xwe şah nebûye, peyvên wî tevlî zimanên din kirin, helbestvanên wî li sêdara xeyalan bi dar xistin, stranên wî bê olan hiştin, rojname û nivîsên wî her û her di gola qedexebûnê de xeniqandin... Ma çi kirin û çi ne kirin bi vî zimanî? Ji keçaniyê xistin... tazî kirin, lê nikarîn ji dilên me rakirina, belê pir kesan zarokên xwe li ser zimanên din bi taybetî yê Erebî tîmar dikirin, lê li aliyê din ji çemê jiyanê, dilê me gelekan bi destê Bedirxan, Feqehê Teyran, Melayê Cizîrî, Behlûl..HWD bi kurdî ji dayîk dibû û bi kurmancî dihat binavkirin, û bi Soranî, Zazakî, Kelhorî û Lorî dihat pêçandin, ne ji bo tiştî, tenê ji ber ku ziman jiyan e, dîrok e, nasname û çand e, ji ber ku zimanê me giyana netewbûna me ye. Lewra, de werin bila ji kerema we be, ev perde li ser zimanê me bûye çend hezar Sal bi destê biyaniyan hatiye danîn, bila îro bi destê me KURDan nûjen nebe, de werin bi Xweda ew hêsan e, tenê werin em destên xwe di govendek kurmancî de bigihînin hev, em helbesteke kurdî diyarî yara xwe bikin. Em ne tenê roja 15-Gulanê ji bo zimanê xwe bikin cejin, bila roj bi roj bi zivirîna erdê li dor rokê re, em bi bûka xwe şah bibin, bes e heya vir, êdî em ne kurdên berê ne.

# "HAWAR"

# Ziman û Zanîn e

Dilovanê Deştê

Lêkolîn û vekolînên ku li derbarê şopandina dîroka merovahiyê hatine kirin, baş diyar kirine ku miletan her û her li ber xwe dane, da ku bingeheke asê ji paşerojeke xweş ji nifşên xwe yên tên re, deynîn. Bingeheke wisa asê û cihgirtî tenê li ser şaristanî, şehrezayî, hişmendî û zanînê ava dibê.

Nemir Mîr Celadet Bedir-Xan ev rastî baş naskiribû; û zanîbû ku bê zimanekî bi rêk û pêk, zanîn jî pêk nayê. Loma, wî perdeya bêdengiya di derheqa zimanê Kurdî de çirand û dest bi karê di ber parastin û fêrkirina zimên de kir. Wî zanîbû ku ziman ne tenê alava axavtin û têkildariyê ye, lê belê ew hilgirê zanîn û şaristaniyê bi xwe ye. Wî di danasîna Hawara xwe de wiha gotiye : "Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwenasîn e. Xwenasîn ji me re rêya felat û xweşîyê vedike. Kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ko ziman şerta heyênê a pêşîn e". Li gora bîr û bawriya Nemir Celadet, nîşana xwenaskirinê ziman e. Ji ber vê jî, piştî kedeke dûvdirêj û xebateke bê rawestan, Nemir di 15ê Gulana 1932an de dest bi




weşandina kovara xwe HAWAR kiriye.

Mîr Celadet pir rewşenbîrên bi navûdeng û welatparêz di nav pêlên derya Hawarê de li hev civandin, da ku çandeke xurt e lihevhatî û bi rêk û pêk pêşkêşî xwendevanên zimanê Kurdî bikin. Bi vî awayî, kovara Hawar bû gulîstaneke rengîn ji gotarên giranbuha û sûdar re. Lê belê, di kovarê de her û her xebata di ber zimanê Kurdî de mijara sereke û bingehîn bû. Hin rewşenbîrên Kurd ku dehkera xebata ji bo kurdîtî û kurdewariyê nas kiribûn, bi nemir Mîr Celadet re bûne alîkar, û ev mijara herî girîng (ziman û çanda kurdî) ji xebata pênûsên xwe re kirine armanc, û di Hawarê de xebat jê re kirine û şopandine. Van xebatkar û têkoşerên Kurd xwe dîtin, ku ew jî weke Mîr Celadet bi xwe, di ber hişyarkirina gelê Kurd de berpirsiyar in. Ev yek bû sedema bersivdana wan ji bang û hawara Hawarê re: " Xorto! Holê bixebite: An bi xwe çêke, an arîkariya ewan bike ko çê dikin, ava dikin ....".

Bêguman, dewlemendiya Hawarê ne tenê bi rengerengiya babet û mijarên tê de dihatine weşandin bû, lê belê bi xebata têkoşer û fidakarên bêhempa, ku bi pênûsên xwe rûpelên Hawarê ji berxwedan û têkoşîna Kurdewariyê re kirine panav û meydan. Ew ji bîr nabin û wê neyêne jibîrkirin, çunkî wan bandoreke giranbuha û pir bi rûmet li çand û zimanê Kurdî kirine. Wan navên xwe bi rengê zêrîn di dîroka Kurdî de nivîsîne. Weke nimûne: Mîr Celadet Alî Bedir-Xan, Xanim Rewşen Bedir-Xan, Dr. Kamîran Bedir-Xan, Dr. Nûredîn zaza, Osman Sebrî, Seydayê Ehmed Namî, Qedrî Cemîl Paşa, Reşîdê Kurd, Tewfîq Wehbî, Hesen Hişyar, Cegerxwîn, ... hwd.

Di dawî de, ka em xebata xwe û ya van berxwedêr û welatperweran bidine ber hev, û vê pirsê ji xwe, ji rewşenbîrên kurd, ji xebatkar û karmendên alavên ragihandinê yên kurdî, ji xebatkarên siyasî, ji partî û saziyên civakî û çandî, ... bikin: Gelo, xebata me di wê asteyê de ye ku em karibin weke " xebateke Kurdewarî " binav bikin!?

# RÛPELEK JI LÊNÛSA JÎNÊ

Vejîna Kurd

Azarî, mîna solînên berfê, bi aramî bi ser govdeya demê de dibare..

Sekeratên şahiyê yên ku ji gewriya welatekî birîndar diherikin ser dêmên rojê û sirûdên koçberiyê yên ku her kêlîkekê li ser lêvên sînorên westiyayî dubare dibin, giyanan berve beyabanên bêzariyê dibezînin û çavên şevê nîvgirtî dihêlin..

Belê..

li welatê min kolanan stranên bêdengiyê li ezber kirine, deşt, gund û bajarokên me bi xwe bûne darebest û mirin, aso kirasekî reş bi ser bejna xwe de berdaye û goristan jî hîn birçî ne.

Buharê xwe ji çîvçîva tilûran û kenê nêrgizan şuştiye û bi xemgîniyê avis bûye..

Kal û pîran milên xwe dane axînên payîzê, kevirên çîrokên kovanbar di mista xwe de dişon, ayet û (sifretelkwînên) dixwînin, û li mizgeftan nimêja xelasiyê dikin.

Keç û xortên ku hîn ji pelandina zaroktiyê têr nebûne, xwe ji welatê şêrîn re dikin canfîda, keziyên xakê bi xwîna xwe hene dikin, û coşê didin govenda azadiyê..

Dayîkan jî pişta xwe dane dîwarên nîvhilweşî, û hêviyên sêwî di nav lepên jiyanê de dilorînin, nameyên zarokên xwe yên ku sînor bi gavên xwe derbas kirine dixwînin, carina jî li ser malên xwe yên wêrankirî, malbatên xwe yên belavkirî û karwana pakrewanan a ku li her sibehekê oxir dibe lehiya rondikan dibarînin, belê.. her rondikek ji çavên wan deryayek ji birînên mirovahiyê ye…

Xwedêyo..!

Gelê min xewn û hêviyên xwe di nav êgir de dipêçe, keziyên Kobanê, Qamîşlo û Efrînê bi tîrêjên rojê şeh dike, û bi vîna mayînê dihûne.. bi milyonan dîlana kul û derdan digerînin, ma qey Xwedêwenda aştiyê jî, ji vî welatî koçber bûye?!!

Li şengalê, hovan bi navê Xwedê keçên me revandin, li bazarên Mûsil û Reqayê firotin, Zeredeşt pir lome û gazin kirin, lê sed mixabin mirovatî ker, kor û lal e..

Erê Xwedêyo.. Em bawer in, ku ev rûpeleke ji lênûsa jiyanê ye, û tu kes nikane xumxuma Ferat, Dejle û Efrînê rawestîne, tu kes nikane zimanê çil milyon Kurd bihelîne, lê tenê em ji wan dipirsin: Kurdino...! kengî emê bibin yek?!!

---

**Kurteçêrok**

# HAWARA DERGÛŞEKÊ

Îlham Osman

Nenî, nenî keça şêrîn.. meke girî û menalîne.. serî li ser sînga min bitewîn.. çavan bigire lê xemlînê.. Bi dengekî banok.. di hembêza evîndar de.. bi ramûsanên coş re.. diya Roza ew kir xewa şêrîn.. Bi awirên evînî li hêmina wê mêze kir.. û careke din eniya sipî ramûsand.. û ji Xweda xwest ku di rojên xweş de tîmar bibe.. mitêla rengereng bi ser canê nazdar de rêxist, û ew di nav xewnên gulene de hîşt.. Bi karê malê re mijûl bû.. jinûbûna keça delal re hêviyên diya Dilşad mezin dibûn. Dengê qurşîneke xinz hêvî û şahiya Diya Roza birîn, bê vîn gav kir qurbane gavan, û bi lez ber ve dergûşa wê bezî, lê çi bibîne!!! Govdê keça biçûk rengsorî bûye, û çilpikên xwînê weseka jînê li erdê dinosîne.. bi qêrîn û hawara diya dilzar re, bav û cîran li wê kambaxiyê kom bûn..

Roza bê deng e.. nefes hêdî hêdî di sînga nazik de dilive.. bê ku zanibin çi bûye.. berê xwe didin nexweşxanê û canê ku can-dide radestî meqes û neşteran dikin.. Tabatî nediket rihê dê û bavê keça bê sûc.. awirên dînok dem çavdêr dikir.. li zîrkezîrka derî dibezîn ku belkî piyamek bibe û keça wan sax bimîne.. piştî çend katan û di tevliheviya hestan de, bijîşk bi mizgîniya saxlemiya Roza çavan ronî dike.. ji metirsiya ku xariye li ser çogan dikeve û simfoniya şîn û şahiyê saz dike.. Gurpis pir dibin.. ev çi bûyer bûn?! ji qurşîna rêjîmê revîn ta ku rastî hovê Turkan werin?!!! Ma gunehê vê keçikê çi ye?!!! Roza bextewar bû û temenekî nû bû para wê.. lê pir zarok bi navê Roza hene bûne qurbana mejitundiya terorê, û bi destên dê û bavên xwe hatin spartin, can û giyan dan ser wê janê.. ma ta kengî emê di çembera qirkirinê de nirxê biha bidin?!!!!!!

**Di cejna ... Dûmahîk**

nekevin bend û davên neyarên azadiya gelê xwe û zanibin ku ew kes û cihên çand û gotara tundî û dijminatiyê di civaka me de belav dikin, di bin çi kiras, perde û navnîşanê de be bila bibe, di naveroka xwe de, ew rajeya neyarên doza gelê me diparêzin, divê em li hember rawestin û wê çandê biqurmiçînin, belav nekin, li şûna wê çand û gotara rêzgirtina hev û hevgirtina civakê biweşînin. Herweha, erk û ustubarê me nivîskar, rewşenbîr, siyasetmedar, komelên civaka sivîl û hemû bîreweran ew e, ku em li saxlemiya civaka xwe xwedî derkevin, rê nedin wan kesên ku dixwazin nakokiyên piçûk mezin bikin, yên dixwazin em doza xwe ya serke ji bîr bikin û bi ser û guhên hev bikevin. Lê baweriya me li cih e, ku bi saya asta zanebûn û hişyariya keç û lawên me yên zîrek, birakujiya Kurdan dubare nabe, û pîlanên neyarên doza gelê me bi ser nakevin.

Belê rast e ku rewşa me zor e, derdên me jî giran in, lê di heman demê de em geşbîn in, hêviyên me germ in û em bawer in ku dema li pêş, dema geşbûna têgeh û nirxên aştî, azadî û wekheviyê ye, dema têkçûna teror, çavsorî, û rijêmên totalîter ên xwînrêj e, dema serketina mafên mirov û azadiya gelan e. 18.05.2016Z-2628K

---

**Gelê Kurd ... Dûmahîk**

ragihandin û 11 mehan berdewam kir, ew bû qurbana pilanên di navbera Yekîtiya Sovyêt û Şahê Îranê û hin aliyên din. Di encamê de Komara Mehabadê têk çû, û serwerên wê jî hatin bidarve kirin, di serê wan de serokê komarê pêşewa Qazî Mihemed... Ya dî, di Şoreşa Nemir Mela Mistefa Berzanî li dijî rijîma Îraqê de, pîlanek di navbera rijîma Îraqê û Şahê Îranê û Hewarî Bû Midyen serokê Cezayirê, di sala 1975an de hate ristin , û di encamê de Şoreşa Berzanî Şikest. Îro roj jî eynî ew lîstik dibe di kiwalisyonan de di nav bera Cezayir,Tirkiyê û rijîma Sûriyê de, bo şerê rêvebiriya xweser a demokratîk li Rojava bikin û rê li ber bêne girtin.

Ya pêwîst ew e ku peywendiyên kurdî û kurdistanî li gor berjewendî û armancên gelê Kurd di her beşekî ji yê Kurdistanê de werin hûnandin, mala kurdî ji hindur ve asê û tekûz bibe, û ya girintir ji her tiştî ew e, ku di nêzîktirîn dem de Kongirê Kurdistanî were lidarxistin, ji ber ku bûyer bilez tên, û nîrên nevdewletî bo rewşa gelê Kurd baş in. Pêwist e em karibin mala kurdî birêk û pêk bikin, hingê emê li gor van qonaxên hestyar derkevin, û doza xwe bi pêş de bidin û mafê miletê xwe werbigrin.

**Ji Bo Rojeke ... Dûmahîk**

bû, ango mirov dikare bêje, ku çalakî tenê di bin siya ala Kurdistanê de hate birêvebirin. Helbet keda endamên ewlekriya çalakiyê û polîsên almanî ji bo ku rê li tevliheviya alan bigrin mezin bû.

**Meydana Heumark** bi sedan ji alên rengîn yên mezin û biçûk tijî bûbû, hejmara kesên tevlî vê çalakiyê bûn li gorî texmînên polîsa Alman û komîteya amadekar di navera 3000-5000 kes de bû.

Ez ji bajarê Munsterê bi rê ketim, tirêna ku ez tê de siwar bûbûm li her çend rawestgehan çend Kurd radikirin. Ciwanên Kurd jî di hundirê trênê de û di rawestgeha guhertina tirênê de (Duisburg bû) herdem stranên gelêrî û netewî digotin û bala Almanan dikşandin. Li stasiyona navendî ya Kolnê em peya bûn, û me berê xwe da cihê çalakiyê, di rê de slogana **"Bijî Kurdistan"** û alên Kurdistanê bala welatiyên Alman û tûrîstên derdora Katedrala Kolnê dikşandin.

Di meydana Heumrkt de ez pêşî rastî siyasetmedar û endezyar Selah Elemdarî hatim, min spasiya wî kir, ji ber nermbûn û bihnferehiya tevgera wan li hember siyaseta hişk ya ku ji aliyê rêvebriya Kantona Efrînê de tê kirin. Rojava hewcedarê kesên aqilmend wek birêz Şêx Alî ji bo ku rê li nakokiyên kurdî-kurdî bigirin.

Her wisa min **kurdekî ji "zurriyeta nifşê dawî yê Ewropiyan"** dît, niha bûye tuxtir.

Baş e, me kî dît û kî nedît!, ji hevalên beşê aboriyê ya zanîngeha Helebê bigirin, ku berî deh salan min ew nedîtibû, heya bi hevalên mûzîkvan, dengbêj û rojnameger.

Ev roj fersendek mezin bû ji min re ji bo ez bo cara yekemîn hunermendê mezin **Nizammetîn Arîç** bibînim, û ligel wî û hevalê wî **Alexander Zerning** bidim û bistînim. Hêjayî gotinê ye jî, ku hunermend Nizamametîn xwediyê sebreke mezin e, bi dehan kes wêneyên xwe pê re girtin, hunermendê me ti acizî nîşan neda, lê ji ber teknînka dengê li ser şanoyê hinekî tengezar bû.

Hêjayî gotinê ye ku siysetmedarên alman jî di vê çalakiyê de beşdar bûn, her wisa çalakî di medya almanî de jî cih girtibû.

**Bi kurtî çalakiyeke serkeftî bû, keda Komîta Amedekar û ya endamên ewlekariyê ji bo biserketina vê çalakiyî heya kêlîka dawî diyar bû**.

Li dawiyê mirov dikar bêje ku **"Ji Bo Rojeke Serbixwe"** alîgirên tevgerên kurdî yên curbecûr li Heumarktê bûn yek.

**"Ji Bo Rojeke Serbixwe"**

## Kurd li Heumarktê bûn yek (Foto)

**Zinar Ala**

Îro sedsalek di ser îmzekirina peymana **Sykes-Pikot** re derbas bû, ev peymana ku qet daxwaz û vîna gelên Rojhilata Navîn nedabû ber çavan, ji ber hibra vê peymanê jî, heya îro xwîna mirovan nemaze jî ya kurdan tê herikandin. Bi kurtî **Brîtanya û Fransa bi rêya vê peymanê, bi rastekê sînor xêz kirin û Kurd di nav çar dewletan de belav kirin.**

Roja 14ê gulanê jî revendên kurdî ji gelek bajarên Almanya û ji çend welatên derdora wê, berê xwe dan bajarê Kolnê ji bo şermezarkirina vê peymanê. Çalakî di bin navê **"Ji bo rojeke serbixwe"** hate lidarxistin û ji aliyê komeke çalakvanên kurd ku xwe wek serbixwe bi nav dikin, ango ew ne girêdayî rêxistineke siyasî ne.



**Komîteya amedekar** agahdar kiribû ku tenê **Ala Kurdistanê** wê di vê çalakiyê de bê hildan, digel vê hişiyariyê çend kes alên din hildabûn (wek alên YPGê/YPJê, ala Êzdiyan, ala PDKê, du wêneyên berêz Abdulah Ocalan.. hwd), lê hejmara van alan gelek kêm e.. 11

# Selahiddîn Mihemed jî Çû Ser Qedera Xwe



Li roja 4/5/2016an endezyar, rewşenbîr, rexnegir û hunermendê şêwekar yê navdar, Selahiddîn Mihemed temenê xwe kir û çû ser qedera xwe. Dilovanî Selahiddîn li sala 1949an li gundê Qujûma-Cindirêsê- Efrînê hate ber ronîka cîhanê. Bavê wî Xelîl Edîb li navça Efrîn ji xwendekarên destpêkê bû, û li salê pêncî û şêstî ji sedsala bîstan, li bajarê Efrînê kargêrê dibistana seretayî bû.

Selahiddîn li sala 1974an dîploma endezyariya avakirinê ji zanîngeha Helebê wergirt. Û ji sala 1970yî de bi zimanê Erebî û Îngilîzî di rojnaman de dinivîsand. Ew li sala 1981ê wek endam di desteya sernivîser ya kovara ((Hunera Erebî)) ya Yekîtiya Giştî ya Hunermendên Şêwekariyê yên Ereb hat vebjartin. Û li sala 1987an de jî di desteya rawêjkar ya kovara ((Huner) ku li Londonê derdiket bû endam. Û li sala 1993an kovara ((Huner)) ya Sûrî ew wek ``Stêrkê Ragihandinê`` vebjart.

Wî ji sala 1978an de wek ``rexnegirê hunerî`` di TVya Sûryê de kar kir, û ji sala 1991ê de bername amade dikirin û li derdora sed fîlmên belgeyî li ser hunera şêwekar û dîroka Sûryê amade kirin, li gel gelek komcivîn û, bername û şevbuhêrkên Tvyê jî kirin.. ew di gelek kongir û pêşengehên navdewletî de beşdar û amade bû, wek: pêşengeha Mosko 1984, 1988, şam 1990, Stembûl 1993, Tûnis 1988,1989, 1991, Qahîra 1996. Kiwêt 1993-1994.

Li Sûryê jî bi gelek çalakiyên rewşenbîrî rabû, wek: Lisazxistina Mehrecana Hezkirin û Aştiyê li bajarê Latqiyê, mehrecana strana Sûrî li sala 1993an,û ew berpirsê komîta wê ya rewşenbîrî bû.

Wî gelek xelat jî wergirtin, wek: Sê mîdeliyên zêrîn li Qahîraye li salên 1993-1994-1994. Mertala zêrî li Kiwêtê. Xelata zîvî li Qahîra 1996. Rêznameke payedariyê ji radyo û TVya Sûryê. Rêznameke payedariyê ji sendîka Hunerên Ciwan li Sûryê, û mîdaliyek ji rista wî ya ragihandinî li sala 1996an. Ew li Sûryê endamê sendîka hunerên ciwan bû, û endamê Yekîtiya Hunermendên Şêwekar yên Ereb bû, û di amojgeha Emerîkî ya jînenîgariyê ``ABI`` endmekî rawêjkar bû ku navdarên cîhanê vedibjêre. Hêjayê gotinê ye, ku dilovaniyê me, ji zû de li şamê rûdine, û li ser dawaxza wî, ew li goristana gundê wî Qujûma li roja 5/5/2016an hate veşartin.

Pirtûkxana wî ya pirtûkan û êlêktronî jî pir dewlemend e. Pirtûkên wî yên çapkirii jî hene, jê: Riya Hevrîşmê.

Bi navê desteya sernivîser a Newrozê û nivîskar û xwendevanên wê em serê malbat, dost, hogir û hezkiriyên wî xweş dikin, çûna wî ziyanek mezin bû ji gelê Sûryê û gelê Kurd re jî.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**

**Êmêla Newrozê:**
**Newroz@yek-dem.com**